**EWQAS HÊSAN DIKANÎ BERMAYÎ YA XWARINÊ BINEQÎNÎ**

Ji bona wê pêwîstiya te bi kodeka zibil û tûrikê zibil yên kaxezî heye. Koda zibil tu yê li metbexê di bin textebendê de û bi cîh bikî. Her wiha tûrikên kaxezî jî wê xwêdiyê xaniyê hûn tê de ji we re peyda bike.

1. Tûrik ber bi jor ve bipêçe û heya dawiyê di kodê de bi cîh bike da ku di cihê xwe de rast bisekine.

2. Bermayiya bi av bila demekê rawestîne da ku bi şilî nekeve tûrikê kaxezî.

3. Ji bo ku tûrik bê girtin pêwîste ber bi jor ve bê pêçan.

4. Tûrikê ji bermayiyê yên tije bûyî têxe gemardank a esmer.

Tenê van tiştan dikarî têxe tûrikê bermayiyê:

- Qalikê fekî û hêk û hêşinahî
- Nan
- Goşt û masî
- Berhemên ji şîr çêdibin
- Şekir
- Qehwe û kaxeza ku tê de qehwe çêdibe
- Gulên çilmisî
- Desmalên kaxezî peçete

Ji xeynî bermayiyên xwarinê pê ve tiştekî din nexe gemardank a esmer. Plastîk û zibilên din wê ji hev belavkirina zibilê asteng bike.

Di derbarî neqandina zibilê de zêdetir agahdarî di malpera www.aos.skovde.se de heye.